


KEPİR

KOVARA ZAROKAN

Jimare 1

Sal 2007



نادي القراءة

**Kovara zarakan, du mehan carekê
bi hevkariya Apec û Spîrêz derdikeve**

Peyva Kepirê

Berpirsê kovarê:

Ali Ciftci

Sernivîser:

Mueyed Teyib

Pêdaçûna ziman:

Mahmûd Lewendi

Nîgar û derhênan:

Necmeddin Bîrî

ISSN 1654 – 5702

Gelek ziman hene ku ji zimanê me pêşkevtitir û dewlemendtir in. Ji zimanê me pirtir pirtûk, kovar û rojname pê derdikevin. Pirtir film û stran pê dihêne çêkirin û gotin. Lê çi ziman ji zimanê me şîrîntir nînin. Ji ber ku ew ji bilî ku nasnameya me ye, yekemîn ziman e me bihîstîye, yekemîn ziman e em pê axifîne û çiqas em zimanê dî fêr bibîn jî dê her ew bimîne xoştîrîn ziman em hest, soz, hizir û bîrênen xwe pê derbibirin, eger em baş fêr bibin.

Mirov zimanê xwe ji dayik, bab, bira, xuşk, heval û hwd fêr dibe, lê bi xwendinê dewlemend dike û ew mirovê nexwendevan be yan ji berdewam nexwîne hem zimanê wî û hem zanîna wî ji dê hejar bimîne û di encam de şansê serkevtina wî ya di jiyanê de jî dê kêmîtir be.

Mixabin, rewşa ku gelê me tê da dijî weha kirîye ku zimanê me li paş bimîne, pirtûkxaneya me hejar bimîne, zarokên me zimanêni biyanî ji zimanê xwe baştır bizanîn û bi wan zimanan jî bi hêasantir bixwînin û di encam da sal bo salê zimanê wan kiz û lawazîr lê dihêt û di dawîyê da dev ji zimanê xwe berdidin û êdî hew pê diaxîvin jî.

Ji bo ku em rê li vê diyardeyê bigirin diviya em hewl bidin da ku pirtûkxaneyeka dewlemend û rengîn ava bikin. Em kovaran derbixin. Her bi vê armancê herdu weşanxaneyê kurdî Spîrêz li Duhokê û Apec li Stokholmê vê kovarê bo zarokên kurd li Ewrupayê derdixin.

Kovara Kepir kovareka navdar e li Kurdistana başûr û ev pirtir ji çar salan e, heyvane derdikeve û zarokên kurd dixwînin û jê hez dikin.

Ev hejmara yekê ye li Stokholmê çap dibe. Hêvîdar in babet, **nexş** û nîgarêñ wê bi dilê we bin û hûn bi pêşniyar û berhemên xwe wê bi xeml û rewştir lê bikin.

Kepir ji bo we ye, xwedî lê derkevin.

Heta hejmareka dî hûn şad û Kepira we ava.

Sernivîser

Adress: Apec Förlag AB

Box 8121

SE 163 08 Spånga/Sweden

Tel: 08-761 81 18

Fax: 08-761 24 90

E-post: apec.t@telia.com

www.kepir.org

www.apec.nu

www.spirez.org

Helbestvanê mezin

Melayê Cizîrî

1570 – 1640

Melayê Cizîrî navdartirîn helbestvanê kurd e. Helbesten wî ciwan, rewan, sivik û kûrwate ne.

Dîwana wî ya ku ji 125 helbestan pêk dihêt li bal me kurdan wek pirtûkeke pîroz têt qebûlkirin. Ev dîwana wî bi sedan salan li seranserê mizgeftên Kurdistanê diha-te xwendin. Bi hezaran feqe û melian helbesten wî ji ber dikirin. Ev dîwana Melayê Cizîrî gelek caran li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê hatîye çapkiran û gelek vekolînên zanistî û akademîk li ser hatine kirin.



Melayê Cizîrî ji bilî ku helbestvanekî navdar bû, zanayekî serdema xwe jî bûye. Ji bilî zimanê xwe yê kurdî, wî bi erebî û farisî jî baş dizanî.

Navê wî Şêx Ehmedê kurê Şêx Mihemedê Cizîrî bû. Li Cizîra Botan ji dayik bûye. Wek zarokên serdema xwe li mizgeft û dibistanê ayînî dest bi xwendinê kirîye. Her li Cizîrê jî çûye ber dilovanîya Xwedê û li Mizgefta Sor hatîye veşartin. Gora wî heta iro jî wek ziyaretgehekê ye, xelk bi berdewamî diçin tewafa wî.

*Şox û şengê, zuhre rengê, dil ji min bir, dil ji min
Awirêñ heybet pilingê, dil ji min bir, dil ji min
Wê şepalê, misikxalê dêm durrê gerden şemalê
Cebheta biskan sema lê, dil ji min bir, dil ji min.*

MAR Û RÊWÎ

çirokeke folklorîk


Amadekirin: MUEYED TEYIB

Rojekê rêuwyek (rêvingîyek) bi rê de diçû. Dengek hatê. Li ser milê xwe zivirî, dît ku li kêleka rê kevirek wergeryaye ser marekî mezin. Mar dike nake, nikare ji bin kevir derkeve. Dilê mîrik gelekî bi mar şewitî, xwe xwar kir û bi herdu destan kevir ji ser mar wergerand û mar xelas kir.

Dema ku mar xelas bû, di şûna ku sipasî rêuwyek, wî xwe li stuyê rêuwyek devê xwe aland û bir binê gotê:

– Ez ê bi te vedim!

Rêwyek veciniqî û




got:

– Ma tu yê çawa bi min vedî?
Min anuha tu ji mirinê xelas kir!

Mar got:

– Zêde gotinan neke. Te çi kiribe
ne xema min e! Madem tu
mirov î, tu dijminê min î, ez ê
bi te vedim!

Ü devê xwe vekir û xwe pirtir
nêzîkî bin çeneya rêuwyek kir.



Rêwî fam kir ku axaftina bi
mar re fayde nake, îcar got:

– Were em ji hinekan bipirsin
eger gotin tu bi heq ï wê demê bi
min vede, tu serbest ï.

Mar got:

– Baş e were em ji
darhêjîrê bipirsin.

Rêwî û mar çûn ba
darhêjîrê û çîroka xwe jê re

vegêran (vegotin). Piştî ku darhêjîrê guhdarîya
çîroka wan kir, ji mar re got:

– Tu min dibînî? Ez havînê li ser mirovan
dikim sî, hêjîrên şîrîn didim wan, digel ku
payizê pelên min diweşin, dîsa jî ew bi das û
biviran bi min dikevin, ta û şaxê min dibirin
û dibin malê dişewitînin. A mirov ew kes in ku
dijminê hemû jiyandaran e. Zû pê vede berî ku te
bixapîne!

Rêwî hema yekser ji mar re got:

– Ka raweste, raweste! Em ji yekî din jî
bipirsin!

Rêwî hîn axaftina xwe temam nekiribû ji
wî alî de kerek zirîya.

– Baş e em ê pirsa xwe ji kerê jî bikin.

Rêwî û mar çûn ba kerê û rêwî dest pê kir
çîroka xwe ji serî heta binî ji kerê re got. Ker
careka din ziriya û got:

– Ax, axx! Hûn min dibînin, min hemû ciwanî û gêncîtiya xwe gorî (bi qurbana) mirovan kir. Pişta min ji ber barê wan xûz û xwar bûye. Roj tuneye ku min ew û barênen wan li pişta xwe nekiribe. Lê çawa ku ez piçekî pîr û lawaz (zeîf) bûm, wan ez berdam çolê. Xwedê zane ya îro yan sibê ez ê rastî revdeyeke guran bêm û ew ê min parça parça bikin. A mirov ev e ha! Jiyandareke zordar û bê wefa ye. Ez bi qurbana wan diranên te yên tûj û jehrdar bim, hema nesekine, pê vede!

Di wê gavê de rovîyekî silav da û hat ba wan.

Rêwî hema yekser ji mar re got:


– Ka raweste, em çîroka xwe ji rovî re jî bibêjin hela ew ci dibêje! Ger wî jî weha got, wê demê bi min vede!

Rêwî ji serî heta binî çîroka xwe ji rovî re got û bû gulpe gulpa dilê wî hela ka rovî ew ê ci bibêje.

Rovî piştî ku guhdarîya çîroka wan kir, got:

– Ka rawestin! Divê ku em herin wî ciyê ku te mar lê dîtîye, divê ku ez wî kevirî bibînim.






Hersê bi hev
re çûn wî ciyî, rêuî
ew kevirê ku mar di bin
de bû nîşanî rovî da.

Rovî ji mar re got:
– Ka were xwarê, xwe
li wî ciyê ku tu lê bû
dirêj ke ez binêrim!

Mar xwe ji rêuî
vekir, hat xwarê û çû wî
cihî û xwe dirêj kir.



Rovî ji rêuî re got:

– Ka wî kevirî wekî berê deyne ser pişta
mar da ku ez bibînim çawa bû!

Rêwî kevir hilda û danî ser pişta mar. Mar
jî wekî berê di binê kevir de asê ma.

Rovî ji rêuî re got:

– De nuha bi rêya xwe de here!

Û zivirî ser mar û got:

– Tu jî di bin wî kevirî de bimîne!

Wexta ku mar dît ku rovî û rêuî da rê, bû
hawar hawara wî û got:

– Ka rawestin, bisekinin! Ma hûn ê bi kude
biçin? Werin em pirsa xwe ji yekî din jî bikin!

Digel van gotinan, qijikeke reş li ber serê
mar venişt û gotê:

– Dev ji wan berde bila ew bi rêya xwe de
biçin. Va ye ez li vir im, ez amade me di bin
emr û fermana te de me!

Noz
Najmaddin Biri

1 KEPİR



BALINDE

gul in li asmanan difirin




Nêzîkî 9000 cûreyên balindeyan li ser rûyê erdê hene. Hinek ji wan pirbicûk in, wek şîravmêjka perhejînk ku dirêjahîya wê şes cm ye û giranîya wê du gram e. Hinek jî gelek mezin in; wek hêştirmelê ku bilindîya wê nêzîkî sê metreyî ye û giranîya wê 150 kilogram e.

Balinde bi form, reng û xwarina xwe ji hevdu gelek cuda ne. Lê bi giştî hemû xwedîyê hin nişanên hevpişk in ku wan ji heywanên din cuda dike. Bo nimûne hemû balinde bi per û pûrt in. Bi wan per û pûrtan tîna (germahî) laşê xwe diparêzin. Her weha hemû balinde bi bask in, bi wan baskan difirin. Hin balinde hene ji ber giranîya laşê xwe nikarin bifirin, an jî baskêni xwe ji bo karekî din bi kar tînin. Bo nimûne kîvî, hêştirmel, pengûen. Hêştirmel baskêni xwe di bezê de bi kar tîne, pengûen di ajnêkirinê de bi kar tîne.

Hemû balinde hêkan dîkin û piştî ku li ser wan hêkan kurk dikevin çêlik jê derdi Kevin. Balinde jî wekî hemî ajelan



şîravmêjk




kîvî



legleg



hêştirmel






pêwîstîya wan bi xwarin û vexwarinê heye.

Xwarina wan jî gelek cure ne; ji şîrava kulîlkan bigre heta bi mês, mûr, dan, tov, masî, beq, mişk, cird û kevroşk. Mirov dikare ji nikilê wan fam bike ka ew çi dixwin.

Piranîya balindeyan hêlînan çêdikin.
Hêlîna hinekan bi rastî nimûneya hunera endazyarîyê ne.


Ji balindeyan hinek xwecî ne, ango sal dozdeh meh li ciyekî dimînin, wek kew, sisik, por û gelekên din. Hinek jî mişext dibin, behar û havînan li cihekî ne, payîz û zivistanan li ciyekî dî nin, wekî legleg, mêşxurînk, hacîreşk û gelekên din.

pengüen





Seyr e. . .



Mêri (kurmorî, gêre) dikare barekî 52 caran ji xwe girantir hilgire.

Sîsirka yekşaxî (cureyeke kêzikan e) dikare barekî 850 caran ji xwe girantir hilgire.

Eger hêza mirovan bi qasî ya mîrîyê ba, wê demê zarokekî pênc salî dê bikarîba filek hilgirta. Ji xwe eger hêza me bi qasî sîsirka yekşaxî ba, wê demê ew zarokê pênc salî dê bikarîba 17 fil bi carekê de hilgirta.



Mikael Kîrnî zarokekî amerîkî ye, di dehsalîya xwe de karî bawernameya unîversîteyê bi pileya nayab ji Zankoya Alambamayê werbigire. Bi vê çendê ew dibe biçûktirîn mirovê ku ev bawernameya wergirtîye.




Salane 500 000 km³ (Pêncsed hezar kilometrekubîk) av ji okyanûs û deryayan dibe hilm û ber bi asmanan ve bilind dibe û paşê dibe berf û baran û dibare.


Kangurû heywanekê ku li Awustraliyayê dijî. Salê carekê dizê û

têjikekê bi tenê dike.


Tiştê seyr ew e ku dirêjahîya têjika wê du cm û giranîya wê jî yet gram e.



Iê rast e !



Mirovekî awustiryayî (nemsayı) bi navê Jon Herlinger ji Vîyanayê heta Parîsê li ser destan çûye. Ev çûyina wî 55 rojan kêşaye û rojê deh saetan li ser destan bi rê de çûye. Wek tê zanîn Parîs û Vîyana 1400 km ji hev dûr in.



Li Rojhelata Afrîkayê gulek heye, ew digel helatina rojê hêdî hêdî dibîşkive û heta nîvro bi yekcarî vedibe. Paşê hêdî hedî devê xwe digire û dema roj diçê ava bi yekcarî devê wê tête girtin. Xelk vê gulê wek saetê bi kar tînin û pê demêñ rojê nas dîkin.



Di sala 1939ê de sed hezar pilingên bengalî li Hindistan, Bengaladeş û Srîlankayê hebûn. Di 1970yî de bi tenê pênc hezar jê mabûn. Anku di 31 salan de 95 000 piling bi destê mirovan hatine kuştin yan jî destê mirovan di mirina wan de hebû.



Niha hejmareke pir kêm ji wan maye û ne dûr e ev ajela ciwan jî ber bi nemanê ve here.



KURDISTAN

ALAYA RENGÎN

Her welatekî alaya xwe heye. Alaya tu welatî wek alaya weletekî din nîne. Ala perûyekî (paçekî) rengîn e bi stûnekê ve tê hilawîstin. Li ser avahîyên fermî, nefermî û carna jî li ser banêن malan jî dihêt hildan.

Hildan û daxistina alayê bi rê û resmên taybet dihêt kirin. Alaya her welatî sembola wî welatî ye. Her miletik şanazîyê bi alaya xwe dike. Xelk serbestî, serfirazî, serxwebûn û azadîya xwe di alayê de dibîne.

Alaya Kurdistanê


Ala Kurdistanê ku iro bi awayekî fermî li Kurdistanâ başûr dihêt hildan ji sê rengan pêk tê: sor, sipî û kesk, di nîveka wê de jî rojeka bîst û yek tîrêjî heye.

Sor: Sembola xwîna gelê me ye ku ji bo azadîya xwe rijandiye û hê dirijîne.

Sipî: Vîyan û hezkirina gelê me ye ji bo aştiyê.

Kesk: Sembola sirûşt (xweza) û dewlemendîya welatê me ye.

Roj: Di mîtolojîya me de pîroz e. Ew hêvîya gelê me ye ku ji taristana sitembarîyê derbasî ronahîya azadî û serxwebûnê bibe.



Alaya Kurdistanê di dîrokê de

Alaya Kurdistanê ku îro li seranserî Kurdistanê tê pejirandin cara pêşî ji alîyê Rêxistina Civakî ya Kurdan di sala 1920ê de li Îstenbolê hatiye çêkirin. Her ev ala di serhildana Agirîyê (1927) de li serê çiyayê Agirîyê hatiye hildan.

Her dîsa ev alaya me di 1946an de bi hin guherînên biçûk bûye alaya Komara Kurdistanê li Mahabadê.

Di dema Şêx Mehmûdê Berzencî de jî kurdan alayeke din bi kar anîne (1922, rengê wê kesk di nîveka wê de girovereke sor û li ser giroverê hîveke sipî heye). Lê di dîroka me de alayê din jî hebûne wek:



Alaya fermî ya Herêma Kurdis tana başûr û hemû Kurdistanê



Alaya hikûmeta Şêx Mehmûdê Berzencî li Silêmaniyê, 1922



Alaya Komara Mehabadê, 1946

Sirûd ü



HAT ROJA BÛNA TE

Hat roja bûna te
Roja çêbûna te
Te pîroz becejna
Jidayikbûna te

Hemî heval hatin
Hemî bi xelat in
Her hemî jî bo te
Bi hêvî û awat in

Evro me şehyan e
Aheng û dîlan e
Paşerojeka ges
Hêvîya me hemîyan e

Hat roja bûna te
Roja çêbûna te
Te pîroz becejna
Jidayikbûna te

MUEYED TEYIB

Helbest

ZIMANÊ KURDÎ

Bi sêr û sur e
Cewahir, dur e
Zimanê kurdî

Bi xemil, rewş e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî

Bi nexş, awaz e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî


Xezel, helbest e
Şemalka dest e
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye
Dengê Xanî ye
Zimanê kurdî

Şûrê Barzan e
Nûra erşan e
Zimanê kurdî

Mertala me ye
Dest pêşmerge ye
Zimanê kurdî


ŞIKOYÊ HESEN




EZ KÎ ME?

Vî wêneyî bikêşê!

Bavê min hesp e.
Dîya min mahîn e
Ez kî me?



Di navbera van herdu wêneyan de pênc şâşî hene.
Mêzeke û nişan bike.



TÎP Ü PEYV

GULBIHAR

Ew peyv ji heşt tîpan pêk tê:

G U L B I H A R

Heşt peyvên nû ji van tîpan çêbike!

1 - - - - - - -
2 - - - - - - -
3 - - - - - - -
4 - - - - - - -


5 - - - - - - -
6 - - - - - - -
7 - - - - - - -
8 - - - - - - -

SODOKO

Van çargoşeyan bi jimareyên 1, 2, 3, 4 pir bike, bi mercekî tu jimore dubare nebin, ne di hêlên stûnî de û ne jî di yên asoyî de.

	1		
		3	
	2		
		2	


PêKeNOK



Di dema razanê de yekî antênek danî ber
balîfa xwe. Hevalê wî pirsî:

– Ew antên ji bo çi ye?

Got: – Ji bo ku xewnênen zelal bibînim!



Sibehekê jinekê mîrê xwe ji xew şiyar kir û got:

– Rabe rabe camêro, müşkek ketiye metbexê!

Mîrê wê bi hêrs gotê:

– Vêca ma ez pisîk im!

Zarokekî ji dapîra xwe re got: – Pîrê tu dikarî gûza bixwî?

– Wî ma ez qurban, diranê min nemane,
ez ê çawa bikaribim bixwim!

– Gelek baş e, a ji te re ev hinek gûzêن min
bila li ba te bin, ez ê paşê werim bigrim!



Zarokekî ji zarokekî din re got:

– Çawa dibe, bavê te solfiros e û tu bêsol î?

Zarokê din jî gotê:

– Ma çawa dibe ku babê te jî doktorê dirana
ye û tu bêdiran î?



Kulîlkêñ Kepirê




Benjamin Garseshebi Cifci



Hêlin Pakdemir



Melisa Karabiyik Cifci



Mîran Bahce



Rêbin Caferzade



Selin Cifci



Vîlda Cilgin



Xezal Caltek




Resen Şêrzad




Hêlin Ekrem




Aram Taha



Nîdar Nubar




Lava Ebdilsitar



Dilşad Xazî



Rondik Serwar



Mihemed Diyar



Remezan Nubar



Fatma Ezîz



Amed Xorsîd



Ciwan Nîbar

KEPİR

No.
1

Sal
2007

Magazine for Children • Issued by Spirez & Apec Publishers

Çend nimûne ji wesanê Apec û Spîrêz

